

SKANDAL!

ASAYIŞ QATILÊ HELEBCEYÊ BERDA

Helebce, Adara 1988 an. Bi hezaran kûştî û birîndar. Sadamê xwînrej, bi bombeyên kîmyewî bajêr dabû bar bombeyan.

Îro jî bi hezaran birîndarên Helebceyê dinalin. Îro jî birîna Helebceya Şehîd rehet nebûye: Nexweş li benda tedawiyê ne, qatil tev nehatine girtin, zîndanîkirin û cezekirin.

SKANDALA ASAYIŞÊ

Pîlotê qatil yê Sadam Hisên, Tariq Mihemed Ramazan di qirkirina Helebceyê de wezîfedar bû. Ew yek ji qatilê Helebceya Şehîd e.

Tariq di girtigeha Silêmaniyê di bin kontrola Asayîşê de bû. Xelkê Helebceya Şehîd li benda dadgehkirina wî bû. Lê SKANDALA MEZIN bi beyana dadgêr Mihemed Al Uraiby derket holê. Li gorî beyana wî, Asayîşa Silêmaniyê gotiye ku, pîlotê qatil ji girtîgehê baz daye.

Li gorî agehdariyên ghiştiye navenda EuroKurd Human Rights li Stockholmê, **buyer çî təkiliya xwe bi revê tune ye. Qatilê zarok, dê, jin û kalên li Helebceyê pîlotê xwînrej Tariq, ji ber hesabên polîtîk hatiye berdan, anku hêzên di nav Asayîşê de çavên xwe ji bo reva wî girtî ye.**

Dezgeha mafê Mirovan CHAK jî mîna EuroKurd Human Rights hizir dike û bi şik nêzî buyerê dibe.

Rûniştvanên Helebceya Şehîd qet baweriya xwe bi beyanên Asayîşê nayênin û li benda wê ne ku, Tariq bi alîkariya Asayîşê hatiye revandin, û pêwîst e, Tariq bê girtin, û cezekirin. Divê wezîfedarên xirab di nava Asayîşê de bêne girtin û mehkemekirin!

Pir eşkereye ku, bêyî dilxwaziya Asayîşê, girtî nikarin ji hepsê bazbidin. Bê hevkarî qet ne mûmkûn e ku mirovek karîbe xwe ji destê wan rizgar bike.

Asayîş, berî niha jî ji aliyê dezgeha navnetewî ya mafê mirovan Human Rights Watch û EuroKurd Human Rights ê jî, ji ber helwestên xwe yên ne însanî hatibû rexnekirin.

SKANDALA nû tenê mesajekê dide mirov: Rêvebirina Asayîşê ne karê PUK û KDP ye. **DIVÊ ASAYIŞ BI GIŞTÎ TÊKEVE BIN KONTROLA HIKÛMETA HERÊMÊ û KESÊN SUCDAR BÊNE GIRTIN, CEZEKIRIN. QATILÊ HELEBCEYÊ DERXÎNIN HOLÊ!**

EuroKurd Human Rights - eurokurd@comhem.se